Emrê borî venagere !

Ser pêhatiyek derbas bûyî

Enver Kohensal

Li gundêe me medrese , an ku xwendingeh nebû, bi mecbûrî ez ji boy xwendinê diçome gundê dewru ber ku hindek li Gundê me nêzûk bin , helbet diçome wan Gundên ku naskirî an jî xizim u lêzimek me lê heba, bo xwendina kilasa 4 a destpêkî ez çome Wî gundî. bi rastî gundek xweş u balkêş, li naw desştekî hilketî ku li her du milê rast û çepê gund gelî û dar û bar û şînkatî , li pêş u paşîya gund deştek rast û cihê hasilê û sê alyê gund an ku Tixûbê gund Çîyayê bilind û hênik û cihê geşt û pincar çina û geşt û geryana kiç û kura di demê Biharê de bi xasimayî.

ji berku 2 heywel li wextê destpêkirina Medresê re derbas dibû , cara ewil mamostayê gund ku Sipahê Daniş u xelkê Bakûra Îranê bû qebûl nekir, got dibe tu herî cihê ku te sala derbasbûyî xwendî hem Karname û hem jî Îmza Mamostayê sala derbasboyî bînî.

Ez û rehmetî babê xwe em çone gundê Kûra jorî û me Mamosta dît û nameyek da me bo mamostaê tazeye min û nivîsî ku : Enver zîreke û heke heyamek jî li ser despêka medresê derbasbûye jî lê tiştek nabe. Roja ku ez çoyî ser Kilasê xerîb û kesê nas nakim û her kes min dinêre û ..... Mamost ez bi xwendikara dam nas kirin î got: Şagirdê taze hatî kesek zîreke û Karnameyek baş heye u mamostayê salê derbasbûyî

wisa nivîsîye , rast li wê sieta ku ez çoyî jorê medresê Kilasa Dîktê , yanî ji ber xweda nivîsîn hebû, mamosta gote min tu amadeyî ku binivîsî ? Min got belê û hemoyan dîsa bera xwe dan min , Bi kurtî ez baverim Nimra yek kesî li min baştir bû, anku kesek pêş min bû. Wê carê hewjalasê min yên taze hemo bi çawek din bera xwe didne min .belê paş heyamekî ez bi hindeka re bûme dost û diçom malê wan. Ez bêjim ku gelik mal xalanê dayka min li wir hebûn û her wisa kes û karê bere babî û Xonî û .... .

Rojekî ku em çend zarûk me ji xwe re li ser Kolîfengê gund Çinebiranê dikir û hindek leyîzên din , Jinek genc u gelik bedev ku li Kaniya gund av dianî bi yek du jinên din re , rast li ber ciyê Lîstina me Satilê avê danîn û bêhin vedan . wê hormetê bangî min kir û got: ma tu ne Korê filan kesêyî ? Nawê Dayka min anî, min got belê, hatê rometê min u got ez filan kesim u min li vî gundî salekî berî niha mêr kirye , carna were mala me , ez kincê te bişom û serê xwe bişo û gelik dildanî dan ber dilê min û gelik keyfa xwe bi min anî, jî ber ku ez bê dayîk bûme û min dayîka xwe mixabin qet ne dîtye , Heke jinekî mihebet bi min kiriba min we dizani ku dayîka mine . Min didîtin hevalên xwe ku dayîka wan dihate pêşîya wan ,heke Baran an befir hatiba , zarûkê xwe maçî dikirin , didan hembêza xwe û destê xwe li ser serê wan re dianîn . mixabin çi carî min ew mihebete dayîka xwe nedît uû Xêncî dayîka Mirov jî çi car û çi kes nikare cihê Dayîkê bigre , lema rehmetî Birayê min heta ço ser dilovanîya bê wexit , hemûcara axînek dikişand û digot: Ax Dayîk.Em dur nekewin, wê hormetê gote min erê tu rengê dayîka xwe didî , xûşkek min jî heye ku gelik kişandiye dayîka teve û Babê min her tim dibêje û ew kiça min rengê filan kesê yanî dayîka min dide û lema em hemû gelik dihebînin. Lê bi hindek hegerê malbatî Babê min û wî Xizmê nêzûke me hat û çoya hev nedikirin ku renge bas kirin li wê nivîsa min de cihê wê nebe . Lê ji bo min dîtin û nas kirinek gelik balkêş bû û min gotê her wexit min karî ez herme gundê wan û sera wan bidim .heyam hatin û çon û sal derbas bûon û çend carek din me hev didît û gelk cara ez bo xwarinekî mêwan dikirm û her

gav digot te qewil da ku tu herî mala bab û xûşka min bibînî , lê nizanim her ew firset bo min amade nedibû. ez hatime temenê 16 uû 17 salîyê û ez taze li Têhranê hatibûme Urmîya rengîn , paş Hemam kirinekî çome wê Qehva ku xelkê herêma me dihatnê , min got kanê nasiyar an jî li malbatê kesek hatye Şiher ku ez bibînim û bi hewre biçine gond û dîtina kes û kar û bab û xûşk û bira û ..... .

Ez li Qehwexanê ronîştbûm û min ça wedixar , min kesik dît û hema ne yêk , weke sed bêjine min ewa heman kesê nêzûk û babê wê Hormetêye ku min bas kirî. Li min nêzûk bû û got: Tu Kurê filan kesêyî , nawê Dayîika min anî ziman , min gotê belê ezim , ço serê min û got ûn hinde bê emekin û gazinde li me weke biraya kir û ..... got zarûkek me a biçûk nexweşe û me aniye Dixtor , kebanî ji ber karê malê li mal maye û ez û Kiça xwe ... Me zarûka biçûk aniye dixtor û ew li filan odeya Misafirxanê ronîştîye , dixwazî here bal wan , min hem şerim dikir ku kesek min çi car nedîtî herme bal û hem jî min dixweat ez wê kesê bibînim ku çend saleke em li dûrve hew nas dikin lê me qet hev û du nedîtye . Ez bi şermî û tipe tipa dil û lê keyfxweşî çom û min derî da, Got : kêye ? min derî wekir , raste me çi car hev nedîtibû , lê di yekmîn dîtinê de , em her dûk , nek dilekî bi sed dilan em hew bûne Aşîq û Meişûq! min xwe pê da nas kirin ,got hema te derî wekir min tu nas kirî, tu dizanî em çend rengê hev didin û babo dibêje ku ez gelik bi şiklê Rehmetî dayîka teme .

Min jê pirsî tu birsî ,tênî , çi bote bînim ? got hema rûnê ez çi naxom , lê min qebûl nekir û ez çome xwarê û min Kebab bo xwe û wê xastin û parê wî dayê û min gotê bîne filan Odê û ez wegeryam bal, em her du jî hema li hew dinêrin. Şerim dikin , dilê me herduya tijî ,lê em nizanin li kîderê re dest pê bikin, ew bi temen sal û sal nîwekî li min biçûktir bû , bi bejin û bal hema hindî min bilind bû, çawê reş, dev û lêvê bi qîyas û difinek biçûk û sometê sipî û ser sometê sor weke Kolîlkê xaş xaşê dikemilî û dixemlin . Ewê tinê gazinde dikirin ku kengêve min gotye xûşka wê ku ezê

herme serdana wan û wê û..... Min jî tinê guhdarî dikir temaşayî bedevî û dangê nazik û rûmeta bedev dikir . Min destê wê girt û gotê ezê hetmen di wextek nêzûk de bibme mêwanê we , destê nerim û gerim , lê destê wê di naw destê min de germiya agir lê diçû û me her dûka tipe tipa Dilka hew dibihîst .Yêk du Maçê şermokî me dane hev û me hêj xwarina xwe bi timamî xilas nekiribû ku babê wê li derî da û gotê Utobos a gund amadeye û niha diçe , xwe berhev bike û em herin . Ew çend wexite hema weke çend deqîqa xilas bû , em bi hewre heta bal Maşînê çûn û dixwaze xatirê xwe li min bixwaze , lê hindî dike destê wê min naqete, alîyekî şerma bab û kesê ku li maşînê de hemû hev nas dikin û Kultûra seqete ku me heyî û ..... çû li ber pencerê siwar bû û pencere wekir û dilê û min tijî bûyî , me her dûya digot: hey maşîn xirabe ç carê neçe , lê Şofir siwar bû û şagird kire gazî kes nema û derê Utobosê girt û ez jî li erdê li ber Pencerê Sekinîme . Tinê got ezê her tim çaw li rêka te bim , min jî gotê ezê bêm dîtina te heke ez sax bimînim .

Dema herî xemgîn!

Mînîbos ê wî demî hetanî li Garacê der diketin û diçone ser cadê jî her hêvîya misafirê xwe diman û Şagird her nav derê Mînîbos ê disekinî û derî nivî dihêla wekirî u fitek li cigarê dida û hem jorde tew Şofir qise dikir û hem jî li ser cadê bi xelkê gund û naskiryare mijûl dibû , hingê Şagirdê Mînîbosê bixwe foris u meqamek hebû . kirasekî gulgulî ber xwe dikir u cotek solkê kondirê panî bilind pê dikir û ..... Heta mînîbos rêket yê dikire gazî unê kengê carek din bên , yê digot ne ez ya danê êvarê bêm hêşta min tiştê xwe hemû nekirîne û yê din dikire gazî ew Zebeşê ber lingê filan kesê yê mine bidne mal û .....Lê Rihan ê şoşa Pencerê jorde daniye û bi çawekî ne , bi deh çawa li min dinêre û ew qadir dike bibe teyrek bifire bê bal min û ez çome nav xem û xeyala ka ezê kengê carek din wê bibînim û pêre mijûl bibim û ax û keser têne min ku çire em hinde zû li hev qetyan. Eynî wekî xwenekî dihate ber çaw , devê biken ,gerdena zer û lvê nazik û devê biçûk , enya kewer û .....nizanim ,belke tinê li ber çawê min Rihan hinde bedev be , dibêjin gotine Jivjî têjika te çend

kirête , got axir hûn pê çawê min lê nanêrin .
Ez bo demek kurt hatibûme serdana mal û piştî çend rojeka ez wegeryame Tehranê , lê ez dikim û nakim şikil û şemayila Rihanê ber çawê min enda nabe , hewceye ku ez bêjim ,bi hendek kesan re mirov mihebeta Xonê heye , ji ber ku li xûnê de em kesê hevû du bûn , dibû hegera ku herçi zotir baveryê bi hew bînin û me bi nisbet hev baverî hebe , lema ez û Rihan jî hinde zû li hew hatin , eger wisa neba belke hinde hêsan neba ku em li heyamek hinde kêm de li hev nêzûk bin û hez bikin .
Belê ez paş çend roja wegeryame Tehranê , salek yan sal û nîwek pêço , rojekê li ser kar kirine gazî min ku Tel te dixwaze! zawaê teye , min bavir nekir , zawaê min ne karek wisa bi min hebû û ne jî di wan çend sala de çi car Tel a min kirye! Elo keremke , nawê min anî û pirsî tu çawayî ? sipas ez başim , xêr be min gotê , xûşka te wa wire dixwaze tere qise bike. Tiqên dilka min hat û eyan bû ku Telek bê heger nine , xûşkê tu çawayî , başî , kes û kar hemû başin ,li dengê wêre min zanî ku xeberek nexweş heye , ne her min bîra te kir û tu her diçî xerîbîyê nayê û ..... Ne ez başim û keyf keyfa mine , yanî tu her bo hindê hatî min re qise bikî bila xercê te zêde nebe , sibê danê êvarê werne filan Misafirxanê ezê tew te qise bikim , ne ne hewce nake ,min got ka tu carê nayêî , mala te , te ez bihecandim to gorna Dayîka me çi bûye ka mire bêje û kelo girî kete qirka min! Xûşka min zanî ku ez perîşe bûm û min da sondê ,got 2 roje Birayê me girtine û kesek wisa nine dûre here û me got tu bêyî , ez giryam û min bavir nekir ku ewa xûşka min dibêje rast be min got her kêbe sax nine , min bihîst bû xeberê nexweş çi car rastew rast nedigotine kesê dûr , lê sond xwar û.... min bêje nebîje qebûl kir û min gotê îro an sibê ez têm .

Hema wê rojê min xwdanê Kar re qise kir û cereyan bo bas kir , ewî birayê min li nêzûk ve nas dikir û bi hewre weke bira bûn , gelik pê narihet bû û got tû giheştî Urmîyê Tel a min bike. karek dest min bê ezê hetmen encam bidim , min hinde gotê li wirabe neçe , Kurdistan niha çer û aloze , lê li rastî de Rehmetî tinê li ber Kurdistanê û şer li Kurdistanê li Tehranê wegerya mal. Ez hema wê gavê çome

Termînalê û min bilît kirî û ez siwarê Îran pêyîma ê bûm ber bi bajarê Urmîyê , lê bi halek ku newek carê derbas bûyî ku ez bi keyf û şadî dihatime welat û dîtina kes û kar û dost û hevala .
Wî demî Termînal a dew behrê ya Urîmyê taze danîbûn , maşînê xetê Têhranê ku hinek zû dihatin hema li Derwazê Urmîyê ku nawê wê meydanê li bîra min nemaye , dema xwe eksekî Şahê gor bi gor li ser pişta hespekî lê bo , niha jî hetmî eksa Xomêynî ê decal li ser pişta kerek lêye peya dikirin û nedibirne Têrmînal a dew behrê , lê wê carê ber eks nebêje em li Merkeza bajêr peya kirine û ez jî li xew de bûme , gazî kirin ku misafir bêne xwarê , min jî weke bar tinê Kifek sipî hebo û hindek cilik û hole û kincê binî tew xwe anîbûn min hilgirt û ez hatime xwarê , min we zanî ku em li derwaze peya bûne , ez li dora meydanê benda Taksî ê me û her Taksî ku tê ez dibêjmê Merkez , nasekne û diçe , yêk , du , sê , nexêr kes min siwar nake , wêcarê ez çome pêş hema naw meydanê , min Taxi sekinand , Haraye gêdesen , li min pirsî , Merçkeze gêderem , harali sen , Urmîye liyem , oxlom be bûra merkez di da , baxmêsen ! baxişlîyesen wala tanimadim .

Ez çom min dûşek girt û taştêyak xwar heta maşînê gûnd tên ka çi heye û ezê kê bibînim û çi bikim û herme gund an mala xûşkê li gire cihû.

Çawê min kete du kirê girtîyên rêjîmê ku xelkê enzelê bûn û çeka caşatîyê hilgirtibûn. Hatne pêşîya min û pirsa birayê min sefyedînê cangorî li min kirin û hinek qisên sivik û tal gotne min.
Nişkêda mistoyê emê caşê meşhûr û xwefiroş ku tevî hemû malbata xwe 40 sale dijî şorişa kurdistanê şer dike hate bal min û got :

-Tu kurrê filan kesê ninî? Navê babê min anî ...
min got raste ez evim.

we çi haj birayê xwe heye?
Ez çi nizanim çûn ez li ser kar li têhranê bûm û nihe gihîştime urmîyê.

Xwest hindekê xwe baş û dilsoj nîşan bide got :
Eyîzê! Birayê te hizbî bû û aqil nebû û qisên sivik... çi ji destê min nayê bo kesên hizbî tenê ser wî karî neba minê harîkarîya wî kiriba ....

Mistoyê emê û ew her du caşên gundê mêşik û hermoyê wê sibe zûyê hatibûn bo wergirtina dengubasên menteqê li dev û zarê gundîyên dewerê, hingê pêşmerge li pirranîya gund û dewerên Enzel, Kinarberoj, soma-biradost, û şipîranê de hebûn nav xelkê de bûn xebat û çalakî û karên teşkîlatî dikirin.
misto û çeteyên xwe dixwestin bizanin ka pêşmerge li kîderê ne û çi dikin?

Maşîna gundê me hat kesukarê mijî navde bûn em pêk xweş bûn û em çone girecohû (kuştargah) mala xwîşka min li wê derê bû. Wê demê girecohû hêj taze ava dibû kûçên teputoz, bê berq û bê imkanat, baranek jî hatiba jîyan tê de heram dibû te nedikarî xoş xoş hatuçoyê jî bikî.
Bawerim niha baştir û awedantir bûye û rewşa wê hatîye guhurrîn.

Em wê navberê serî li her cihekê diden bo xeberek eseh derbara birayê min û kes jî ya rast bo me nabêje car me dişînine sêro yê, sêro me dişîne pasgaha nazîyê, ew bo leşkerê, leşker bo dadgaha inqilabê ya ne inqilabî çendîn navend û organên sipaha tirorîstî.
Paş nêzokî 3 heyva li rêya hevaleke sefyedîn ku me'mûrek karbidest li zîndanê bû me zanî ku dane zîndanê. Evî wextek bo milaqatê bo me wergirt û gote min bi tenê tu were.

Ez wî çaxî 18 salî bûm navê min bo serbazîyê derketibû, karteke medresê ya qolabî berîka min de ye yanî kurrik qutabîye û dersê dixwîne û ez newêrim sicîla xwe danime bal xwe.ewa cara ewil û axerê bû ku min temenê xwe de zîndan didît, rê

nîşanî mida û ez çûme ber çendîn pencera ku alîyê nav de zîndanî dihatne ber kabînê û salonê de jî milaqatîyên wan lê gel sefyedîn kesek din jî hebû. Pêş ku ez goşîya têlfûnê rakim min silavek bi dest da wan, ew kes mirovekî bednav û caş bû xelkê gundê birayên min xirabe-sincî yê bû ku malbata wan jî weke ya mistoyê emê dest li cinayeta dijî kurda û hizbê hebûn navê wî eskender hinare naskirî bi sinco bû.

Sinco bal sefyedîn sekinî bû, min we zanî ku ew jî hatîye girtin gel birayê min û migo renge xeberek gotinek bo malbata xwe hebe bêje min, min bi îşareta dest silavek lê kir û min li sefyedîn pirsî : sinco jî dixwaze tew min qise ke? Sefyedîn bera xwe da sinco û bi dengek bilind û bi kerb got :

- ne bira, sinco wira ye ku bizane ez û tu çi qise dikin ku guzarişê bide zîndanê, wira jî her kar û wezîfa xwe bi cî tîne.

Sinco tiştek gote sefyedîn lê deng bo min nedihat. Milaqat ber bi xilas bûnê diço bira hinek daxwaz kirin dixast xanima xwe bibîne û kinc û cilik û pare bo bişînim... bi dilekî kol û xem me xatir ji hew xast.

Ez hatme sûkê min çend dost û heval dîtin rengê wan tûkê wan li min şîntir û nexweştir, migo we xêre?
- Îro Yar memed tahirî û Sadiq kohî bi destê du xayîna bi navê Elî û Zilfo hatine şehîd kirin, ewan du xayîna xwe li pêşmerga nêzok kiribû bo zerbe lêdanê û mixabin îro ew teror kirine.

Cangorî Yar memed li binemaleke şorişgêre gundê karêzê û kesayetîyeke naskirî bû li dewerên enzel, kinarberoj, soma_biradost û şipîranê, lema te kê didît xemgîn û nerihet bûn û basa wê bûyera nexweş dikirin.

wira de dixazim basa çawanîya girtina sefyedîn û delîla girtina wî bikim.
bira li gund dikan hebû, weke ku min serwe jî bas kir pêşmerge li menteqê de bûn û

zû zû serdana gund dikirin bo hewceyî û pêdawîstîyên xwe û karên rêxistinî û ya rmetîyê.
Birayê min her tim wesayil û hewceyîyên pêşmerga bo wan dabîn dikir weke pêlav û cilik û cigare û .... bira hem endamê hizbê û hem jî şorayê hizbê bû li gund. Kesekî gundê xirabe bi navê Mecîd ku ji malbatek feqîr û belengaz bû û babê wî nabîna û dayka wî kerr û lal bû bibû pêşmerge, Mecîd bi temen li min biçûktir bû wextê min çarim dixand ew dûvim bû. Mecîd piştî heyamekê wedigere û diçe xwe teslîm dike û dibe tewab, hind ser wê ra derbas nebû careke din diçe nav pêşmerga û çeka fermandeyek dewletî jî dibet.

Hindek dibêjinê mecîd hizbê gotîye tu gere emelîyatekê dijî rejîmê bikî ku em bikarin bawerîyê bi te bikin.
dibêjin mecîd bo dîtina dayîk û babê xwe diçe gund, serbazê paygahê têne dikana birayê min bo tişt kirrînê wextê derdikevin mecîd serbazekê ber derîyê dikana sefyedîn dikuje û direwe xwe xilas dike.paygah dest bi teqê dike û dikevine nav gund û diçine dikanê û dest bi lêgerîn û bazdîdê dikin, hêbetek medarik, êilamîyên hizbê û deftera qera ku têde nivîsîbû kadir û pêşmergên hizbê hinde cotê solik û xwarin kirrîne û j3 û demançeyekê dikanê de digrin.

Ez piştî milaqatê çûme gund û min çawanîya milaqatê û qise dana xwe û sefyedîn û daxwaz û pêdawîstîyên wî gel babê xwe û xanima sefyedîn bas kirin û ez çend roja jî li gund mam, û paşê jî hatime ûrmîyê û çome mala xwîşka xwe û bo wê jî min basa bira û xebata xwe kir ...

Dibêjin:" xev u xarin kesê nebarin" bi rastî jî wê heyamê hem ber sefyedîn û hem jî ber bêkarîyê min haj rihanê nemabû lema min biryar da biçme dîtna wê çon hem halê me nexweş bû hem jî min gelek bîrya wê kiribû hem ewan jî zanîbû bo girtina bira û min xast ew jî bizanin ka me çi kirîye?

Herkî dibêjin : mêvanê cendik şirînin hhhhhhhh mijî xwest bi dest û dilek tijî biçme dîtna rihanê ku hem cîyê xwe dilê wê da hem jî mala wan de xweştir û germtir bikem hhhh.

Du dostê min yê şirînîpez hebûn ku bira bûn û cîyekê da kar dikirin şirînî çêdikirin û gelik jî hêja, rihsivik û kêrhatî bûn, ez çome dîtna wan û migotê du qotî şirînîyê herî baş bo min amade kin û min hedyeyek taybet jî bo rihanê kirrî û maşîned derbest girt û yallah ez çome gundê wan.
havîn bû dema hasilê bû zelam hemû li karê dirûn û kutan û rakirinê dabûn, paş firavînek direng ez gihîştim gund û mala wan.

Min silav kir û jor ketim.
- ayy tu çawa hatî ez bawer nakim! Çawê min rêya te bû te qewil dabû tu zû bêy ... te nan ça xarine? Ka bo te çi çêkim?

Hedye wekirin bi şermek şirîn sipas kir û weko gulê sumetê wê sor bibû.
Wekî bakurî dibêjin heyecanek xweşik em girtin û dilê min bi tundî xwe dikuta.

Dayka wê hat bal min û rihanê rûnişt pirsa mala me û sefyedîn dike ejî şerma de xoh didim û wekî xaşxaşkê sor bûme. Piştî nan û ça xwarinê rihanê got heke tu hez kî em gel hew biçine nav bostan hindek pincar bo şîvê bînin û avekê jî bidene kerdîya.
Êvarê bab û birayên min te bibînin yê gelik keyfxweş bin.

ewê hinek pincar çinî û av berda ser bostan got ezê herim çayekê bînim wekî dîyar avdanî zû xilas nabe û qisên min û te jî gelikin bi kenîyek şirîn û xweş çû û min cigareyek berdayê û meşa keva guzel mêze dikir .
Me digot çima hetanî nihe me hevudu nas nekiribû û xwe ji wê xweşî û heyecanê bêpar kiribû?

Xwîşka wê ya mezin gelik bi başî basa min kiribû û ew jî bê tesîr nebû wê peywendîyê da. Rihan rengê dayka min ya rehmetî dida û mijî kêşabû dayka xweve û curreyek têkilîya xwînê jî navbera me de hebû.

Ewê pincar dikir min bi merê bestewerên parêz digirtin û avdanî dikir lê xuya bû ne min dikarî karê xwe bi durustî bikim û nejî wê, me şerim jî li hev dikir. Ya herî balkêş me nedikarî qisa dilê xwe bêjin. Ez 18 salî bûm ew jî yêk du salan li min biçûktir bû. Em her du jî xam bûn lê heyecan kelejan şerm û xweşî tevhev bibûn.

Êvarî çaxê pale li dirûnê wedigerîyan em jî wegerîyan malê, bab û birayê wê ez gelik xêr anîm û bi dîtina hev gelek şad bûn. Her çend dilê min dixast ez zêde bimînim û wan jî gelek teklîf bo min kirin roja sêyê min biryar da wegerim mala xwe.

Roja sêyê pêş xatir xastinê da dîsa derfet çêbû me çend eksek kêşan û min sieta xwe weke xelat li destê xwe kir û kire zenda wê de, xemgînî li dilê me her duya de rûniştibû digot tuyê careke din kengê bêy? Mijî got ezê werim lê kengê nizanim.

Min û sê hevalên xwe biryar dabû ku em tevlî refên pêşmerga û şorişê bibin her sê gundîyê me bûn lê min xeber ji ber gelik sedeman rihanê re negot. Me xatir ji hev xast û bi dilek tijî xem û xweşî em jew weqetîyan.

Min li posta pêşîyê da basa kesekê binavê Mecîd kiribû ku serbazek ber derîyê dikana sefyedîn kuştibû ...

Mecîd dîsa wegerîya bû nav hizbê lê wê carê tê girtin û zîndanî kirin. Min paşê bihîst ku mecîd û çend girtîyên din ku bexşdarê sêro yê jî yêk li wan bû karîbûn zîndana hizbê de birevin. Hind pê neço ku hat zanîn mecîd hatîye kuştin lê kê kuştibû çire kuştibû nexuya bû.

Min berê jî got dayka wî yêke reben belengaz kerr û lal bû tenê jî mecîd hebû, piştî çend sala min bihîst ku hêşta kuştina mecîd bawer nekirîye û her kes pirsa mecîd lê dike bi îşareta destan dibêje mecîd saxe yê bê ez çawerê wî me.

Ez wegerîyame têhranê ku heval û hevsozên xwe bibînim da ku em biçine nav refên şorişê.
çaxê ez li têhranê bûm xebera şehîd bûna du qehreman û mêrxasan bi navên Hacî nicatî fermandê desteya şehîd Yaver û Kamil gelebanî me bihîst. Ew du can gorî ketibûne kemîna dujmin û tevlî karwanê nemiran bibûn.

Bûyera tal û cergbire dinê ku me bihîst şehîd bûna sê egîd mêrxas fermande û kadrên devera şomalê bû ku dengwedan û xemgînîyek mezin li hemû şomalê da li pey xwe anî ew jî şehîd bûna Bapîr mewlûdî kadirê komîta ararat û endamê heyeta icrayî, Kerem keleşî fermandê lika du ya şehîd kemal, Tajdîn bêhnam fermandê desteya şehîd mûsa girêdayî lika du bû.

Ew sê cangorîyên bi heybet û naskirî li devera şomalê li çîyayê şêx bazîd ketibûne kemîna caşên xwefiroş û mixabin şehîd ketibûn. Li dest dana wan sê egîda karesatek mezin bû bo hizbê û bizava rizgarîxwazîya gelê kurd li şomala kurdistanê çonku insanên naskirî û hezkirî bûn nav gelê xwe de.

Hevayek giran tem û mij balê xwe ser şomalê de kêşa bû xelk xemgîn bû , heyamekê piştî wan bûyerên tal min biryar da herme nav hizbê lê hevalên min wê demê amade nebûn û qewil dan ku ewê jî hetmen piştî min bên, ewe bû zistana sala 1363 hicrî ez çome nav refên pêşmerga û resmen cilubergên şanazîyê min li xwe kirin.

Hevalên mijî sala 1364ê li herêma mirgewer gelîyê bênarê gihîştine me û bûne pêşmerge û çeka şerefê dane ser milê xwe. Yêk ji wan Sadiq baqî kadrê xwedan kede komîta selmasê bû ku paş çend sal xebat û têkoşînê canê pîroze xwe gorî doza gel û welatê xwe kir û hevalê din jî nihe li Amrîka dijî ku ez saxî û silametîyê jêre dixazim.

Ez pêşmerge me, sal û zeman derbas bûn rojekê min birayê rihanê li zozanê tirgewer dît û em gelik bi dîtina hev xweş û şad bûn me hevdu himbêz kir. Piştî ehvalpirsî û xeberdanê daxaza eksekê li min kir, mijî gotê keko eks bal min hebin jî bi çekwe hatîne kêşan eger destê te da bên dîtin yê te aciz bikin.
got:
- rihanê daxwaza eksê te kirîye?
+ Ma rihanê hêj mêr nekirîye?
- Ne xudê hêşta li hêvîya t e ye

Bi dîtina wî ez xoşhal bibûm bi bihîstina xebera wî ez xemgîn bibûm li alîkê jî kêfxweş bibûm kesek jî heye ku min dihebîne û li benda mine lê alîyê herî sereke xwe dispêrim dilê xwe, mejîyê xwe, wijdana xwe, axir car ezab wijdanê ez guhişandim û min gotê :
- Ezîzê ez nihe pêşmerge me şev û roj nava şer de me dibe îro bêm kuştin dibe sibeyî, ya rastî wî halî de ez bo jin anînê ne amade me bêje rihanê bila here ser av û risqê xwe!

Rihanê mêr nekir, piştî çend salan ez bi kesek din re zewicîm ku hasila wê zewacê keça min ya delal Sîber e. Min û dayîka sîberê jî piştî çend sal jîyana hewbeş ji hev cuda bûn.

Çawa ku min serwe jî got hem wek wefayek hem weke ezabi wijdan hem jî weke evîndarîya ku navbera min û rihanê de hebû min bi rêya kesukarên xwe pirsa saxlixîya rihanê kir û min xwest bixwazim lê mixabin ber hindek deb û resmên xelet û seqet ya civaka kurdî û malbatên kurd gihîştina min û rihana hêja muyeser nebû.

Hevalên hêja!

Dibêjin her mirovek weke heyveşevê rûyê xwe yê geş û reş (baş û nebaş) hene, lê tişta ku hemêşe bala min dikşîne ewe ku em hemû giranîya xwe didine ser alîyê xwe

yê baş û geş ema xwe li alîyê reş û nebaş xewre dibin di halekê de ku şexsîyet û kesayetîya her kesî li her du alîyên reş û geş pêk tê. Mexseda min ewe ku bêjim min jîyana xwe bi hemû qencî û neqencîyên xweve gihandîye pêncî û çend salan min niha du zarokên kiç du kulîlên bên xweş binavê sîber û sîtav hene ku berhemê jîyana min başî û nebaşîyê minin.

Roja ku me çeka şerfê li milê xwe kir me soz da ku bo bidest anîna azadî û mafên xwe şer bikin. Azadî ji xwe tê zanîn ka çîye, maf jî gelek gelek zêdene, mafê me bû em jî weke zarokên netewên din bi naz û nemet mezin bin bixînin perwerde bibin aqil û jî bibin , bibin xudanê ferheng û kultûrek bihêz lê mixabin ew bo me çênebû em pirranî dêmî û xwelîserî mezin bûn. Dixwazim bêjim jîyana min berhemê curra perwerdeya mine erê şaşî û xeletîyê min zêde bûn lê çare jî çinebû.

Gelik sipas ji we ezîzan re.

Bimînin di xêr û weşiya de

Norwêj 24 augost 2020